**Hin zanyarî sa dêbavan li bara xwrinên li dibistanan**

Dêbav û sergêrên hêja,

bajarê Kîlê (Kiel) dil heye ku hemî xwendekarên keçik û lawik derfeta xwe ya perwerdehiya guncaw hebin. Bi vê mebestê xwendekar jibo hêvosîna çêtir, hewcedarê wadeyeke xwarina germ di rojê da ne.

Jibo malbatên ku derhata wan kêm e, xerciyeke alîkar jibo perwerdehiyê tê raberkirin û bi vî awayî pişta wan tê girtin. Diravê ku ewna werdigirin jibo dabînkirina van babetan e

- Amor û alavên nivîsînê û pêdiviyên xwedninê,
- Klûba werzişê û
- Xwarina li dibistanê.

Dêbav pêwîst e jibo her nobeya xwarina dibistanê tenê 1 Eoruyê bidin. Lê gellek ji malbatan nikarin viqas dirav jî bidin. Binayata `Perwerdehî, hêzê pêk tîne` heta niha alîkariya van malbatan kiriye. Vê binyadê diravê ku malbat nikarin bidin, qebûl kiriye.

Lê mixabin ev bvinyada êdî nikare alîkariya tevahiya xwendekaran bike; Ji ber ku alîkariyên berhevkirî têrê nake.

Ev binyada wê ji meha Tebaxa 2017`an (Agûst) bikare tenê alîkariya xwendekarên dibistanên seretayî û dibistanên kesên astengdar bike.

Eger zarokê/ we li pola pêncan an jortirê dixwîne, divê bi xwe her rojê 1 Euroyê jibo her wadeya xwarina dibistanê bide. Şirketa ku xwarina dibistanê dabîn dike, wê zûtirkê digel we peywendiyê bigire.

Digel rêz û silavên germ

……………………………………………………………………………………….

**<u>Belgeya Piştrastkirina wergirtina nameyê</u>** (Jibo wergirtina zanyariyên têkildarî xwarika dibistanan)

Ji kerema xwe jibo piştrastkirina wergirtina nameyê, vê derê îmze bikin.

Vê belgeya piştrastkirinê heta roja……………….radestî dibistanê bikin.

………………………………………………..